Herausgegeben vom
Niedersächsischen Ministerium für
Soziales, Gesundheit und Gleichstellung
Hannah-Arendt-Platz 2
30159 Hannover

März 2016

www.ms.niedersachsen.de (Service: Publikationen)

Diese Broschüre darf, wie alle Publikationen
der Landesregierung, nicht zur Wahlwerbung
in Wahlkämpfen verwendet werden

Niedersächsisches Ministerium für
Soziales, Gesundheit und Gleichstellung

Şîreta jinên pê ducanî bûna **nexwastî**

Kurmandschi

Niedersachsen

Lîsteya pêvek

Destpêk 05

Rewşa destpêkî 06

Pêngava yekim: Rabêjên Pêdivîyên jiberbirina zarrok bê ceza 08

Pêngava duyem: Diravdana xercan 11

Pêngava dawî: Jiberbirina zarrok 16



Destpêk

Ducanî dikare bibe sedema kêfxweşî, rezamendî û hêvîyê. Herwisa dikare bibe sedemê diltirsî, nigeranî û bêhêvî bûnê, bi taybet di jinên ku ne gor dilî xwe ducanî bûne yan bi sedema ducanîyê saxlemîya wan dikeve ber metirsîyê. Di eyaleta Niedersachsen torek giştî ji nêzî 250 navendê dewletî yê rabêja pirsgirêkê ducanîyç hene ku di rewşê asteng da rabêja pêşkêşî jinên ducanî diken û liser derfetên destek dan û piştîwanî ji bo jinên ducanî û dayîkan – wek civata netewî ya „Dayîk û Zarrokan- parastina jîyana dînya nehatî“ – û yan civata heremî ya „Malbata dilnigeran“ – agadarîyan pêêkêş dike. Di gelek malbatan da pirsgirêkên dikarin di nêrîna yekim da wekî çîya yek mezin xûya bikin, lê bi alîkarîya pipora hûn dikarin ev çîya biser bikevin. Lîsteya navendên rabêja pirsgirêkên ducanîyê di Niedersachsen ê dikarin di belavoka taybet û yan di nîşanîya înternetî ya jêr da peyda biken:
www.ms.niedersachsen.de > Themen > Beratungs- und Serviceangebote > Schwangerschaftskonfliktberatungsstellen

Eger jinek paş pêkanîna rabêja pêwsît biryarra jiberbirina zarrokî girt, ev şîrete agahîyên pêwîst liser pêdivîyên Jiberbirina zarrokî bê ceza û herwisa liser astên pêwîst bo pêkanîna Jiberbirina zarrok pêşkêş wê dike. Herwisa liser qebûl kirina xercên Jiberbirina zarrokî bo jinên kêmderhat yan bêderhat ji alîyê eyaleta Niedersachsen agahîya pêşkêş dike. Ev şîreta herwisa pêdivîyên Jiberbirina zarrokî di babetên kilînîkî û cezanasî ji liber digire.

Rewşa destpêkî

Eger jinekê biryarra ducanî bûnê girt, ji alîyê zagonê derfetên berfireh bo rabêj û piştîwanîya wê hatine terxankirin. Her mêr û jinek dikare liser babetên jêr rabêjê werbigire:

- Babetên regezî, bergirî, û bipergal kirina malbatê,
- Piştîvanîyên malî û alîkarîyên taybet bo zarokan û malbatê, wekî zagonên taybet liser pirsgirêkên şolê,
- Taqîyên bergirîyên dûcanîyê û xercê zanê,
- Xercên civakî û abûrî bo malbatên ducanî, bi taybet alîkarîyên abûrî û alîkarî di peyda kirina avahî, şolê û yan perwerdehî û yan parastina wan,
- Alîkarîyên taybet bo kêmendaman û malbatên wan, bo zarokên ku pêş û paş ji dayîk bûnê di wan da nexweşîyên cismî û derûnî hatine naskirin, şêweyên Jiberbirina zarrok, bandorên derûnî û
- cismî yê Jiberbirina zarrok û metirsîyên taybetî,
- Çareserîyên berdest bo pirsgirêkên derûnî yê civakî yê taybet bi ducanîyê, bi taybet paş zelal bûna nexweşîyên pêş dinya hatinê,
- Nêrînên hiqûqî û derûn nasî yê qebûl kirina zarrokê nevsî.

Di navendê rabêjê da dikarin bo wergirtina mafê xwe liser peydakirina avahî, peydakirina perestarî bo zarrokên xwe û yan liser berdewam bûna perwerdehîya xwe, rabêj û piştîvanîyê werbigirin.

Civata Malbata Dilnogeran ku ji alîyê eyaleta Niedersachsischen hatîye damezirandi, ji malbatên ku bi sedemên nepilankirî tûşî pirsgirêkan dibin, alîkarîyên abûrî pêşkêş dike.

Yek ji xebatên serekî yê civata alîkarîyên abûrî li dema ducanîyê û zanê ye. Ev civate herwisa budceya civata netewî ya „Dayîk û Zarrokan-parastina jîyana dînya nehatî“ di Niedersachsischen da jî belav dike.

Alîkarîyên wek kirrîna kincên taybet, berhev kirina cilê zarroyan û yan guhertina cîyê rûniştinê hatine berçav girtin.

Agahîyên bêtir liser valîkarîyên abûrî dikarin di navendên rabêja ducanîyê û rabêjên pirsgirêkên ducanîyê ji bidest bînin.

Ducanîya nexwastî dikare kesê ducanî bêxe nava astengîyan. Dibe ev biryarrê bigire ka zarrokek (dî) dixwaze yan na.

Alîkarî û piştîvanî liser çareserîyên gengazî û agahîyan liser babetên ku bo Jiberbirina zarrok divê bêne lêkolîn kirin, dikarin di tevahîya navendên izindarê rabêja pirsgirêkên ducanîyê bidest bînin.

Pêngava yekim: Rabêj

Hûn ducanî ne û liser jiberbirina zarrokê xwe difikirin, di rewşa wisa da wergirtina rabêjê ji hêla zagonî ji were pêdivîye, eger ku babetên cezanasîyê nehatibe baskirin. Jiberbirina zarrokê bê nîşanî heta hefteya 12 a ducanî bûnê û tenê paş wergirtina rabêjê gengaz e. Rabêj dibe di yek ji navendê izindarê rabêja pirsgirêkên ducanîyê pêk bê. Nîşanîya navendên izindar di eyaleta Niedersachsen dikarin di belavoka taybet da peyda bikin.

Mafê we ye ku li hember kesê rabêj kirî nenas bimînin. Li dema rabêjê, ji were şîret, agahî û alîkarîyê . Rabêj dikare di çend ciwîna da jî pêk bê. Encama rabêj ne biryarra dawî ye û biryarra dawî gel we bixwe ye.

Navenda rabêjê divê di dawîya rabêjê da bel-geyek rabêjê bi nav û roja rabêjê ji were pêşkêş bike. Rabêj belaşe. Di rewşa hebûna pirsgirêkên kilînîkî bo jiberbirina zarrok tenê paş hefteya 12 a ducanî yê (SSW) bijîşkê tedawîker berpirse ser pêşkêş kirina rabêjê ji were. Ev tê were liser rabêja tekmîlî ya derûnnasîyê agadarîya pêşkêş bike – û eger bixwazin- tê navendê rabêjê ji were bide nasîn. Hûn dikarin hez nekiorina xwe ji wergirtina rabêjê re rabigehîne. Lê belê rabêja bijîşkî û derûnnasî alîkarîya we dike di girtina birayarrê da. Rabêjê derûnnasî dikarin di navendên rabêja ducanîyê û rabêjên pirsgirêkên ducanîyê di Niedersachsen da bidest bînin.

Eger pey bijîşkî digerên bo rabêjê, balkeşe bizanin ku ev bijîşke bi çi awayî izina pêkanîna jiberbirina zarrok nade. Baştire bilez rabêj ê werbigirin daku bikarin di tenahîyê da biryarrê bigirin.

Pêdivîyên jiberbirina zarrok bê ceza- sê rewş

1. Jiberbirina zarrok paş rabêja bê nîşane (Rêzikê rabêjê dijî zagonê ye lê bê ceza ye jî, eger:

- Di hefteya 12 a ducanî yê da pêk bê,
- Paş rabêjê di yek ji navendê izindarê rabêja pirsgirêkên ducanîyê pêk hatibe.
- Herîkêm 3 roj di navbera rabêj û jiberbirina zarrok da navber
- bê dayin û pê pêşkêş kirina belgeya rabêjê û ne bi daxwaza kesa ducanî ji alîyê bijîşk pêk bê.

Ev babetene liser jiberbirina zarrok pê dermanî ji liber digirin, lê ev şêweye tenê heta roja 63 ê ji destpêka bênimêjîya dawî izindare.

2. Jiberbirina zarrok bi pênasîya kilînîkî dijî zagonê nîne û zeca jî liser nayê sepanin, dam ku:

- bi rezamendîya kesa ducanî
- ji alîyê bijîşkî pêk bê û
- xebatên bijîşkî pê berçav girtina rewşê nihaû sibe roja şexsî pêk bê daku metirsîya mirin û yan zirarê cismî û derûnî ji kesê ducanî re, bergirî bibe. Saxlemîya kesa ducanî vebirre.

Di rewşa hêvî kirina gehandina zirarrê ji zarrok re nabe tenê zirarr bixwe bên berçav gir-tin belkî dibe astengîyên derûnî cismî yê bisede-ma vê ji di rapora bijîşkî da bêne berçav girtin. Bijîşkê we dibe destpêkê ji were rabêj pêşkêş bike û liser mafê we bi rabêja tekmîlî ya derûn nasî ji were rabigehîne û eger hûn bixwazin we ji navendên rabêjê re bide nasandin.

Bijîşk tenê paş derbasbûna sê roj ji şiroveya kêşeyan di tedawîya pêş zanê û yan paş rabêja gel bijîşk, belgeya şiroveya bijîşkî tomar biket.

Pêngava duyem: Qebûl kirina xercan

Ev maweye, li dema hebûna metirsîya cidî bo saxlemîya şexsê nayê sepanidin. Rabêja gel navenda rabêjê ne icbare.

3. Jiberbirina zarrok pê şiroveya ceza nasîyê dijî zagonê nîne û ji ber vê jî nayê ceza kirin dema ku:

- Bi şiroveya bijîşk kesa ducanî rastî destdirêjîyê yan bikaranîna xeraba seksî hatibe,
- Sedemên bêgûman bo pêwendîya ev tawanê gel ducanîyê berdestbe,
- Ji dema pêkhatina tawanê zêdetir ji 12 hefteyan derbas nebe
- û kiryar bi rezamendîya kesa ducanî
- ji alîyê bijîşkî pêk bê.

Liser jiberbirina zarrok pê şiroveya ceza nasî rabêj nepêwîste, tevî ku eger hez bikin tê pêşkêş kirin. Liser tevahîya jiberbirina zarrok ev xale cîyê balkesîyê ye ku bijîşk ku rabêja pirsgirêkê ducanîyê pêk tîne, izina pêk anîna xebata jiberbirina zarrok tune ye.

Jiberbirina zarrok pê şirove ya kilînîkî yan ceza nasî, xercê jiberbirina zarrok bo jinên ku bîmeya xizmetê dermanî ya dewletî wan li ber digire, ji alîyê bîmeyê tê dayin. Bo jinên ku bîmeya xizmetê dermanî ya şexsî wan li ber digire divê pêş emelê gel bîmeya xwe ser ev babetê rabêj biken ku gelo xercên jiberbirina zarrok pê şirove ya kilînîkî yan ceza nasî liber digire yan na, ji ber ku sîyaseta bîmeyên cûda, cûda ye.

Jiberbirina zarrok pê rêzikê rabêjê ne ji alîytê bîmeyê şexsî û ne ji alîyê bîmeyê şexsî nayê liber giritin û dibe xercê vê şexs bixwe bide.

Eger bîmeya dewletî we liber bigire, xercên kêlekî yê ev pêvajoyê wekî taqîyên destpêkî û yan dermanê bandorên kêlekî yê pişratir, ser milê bîmeyê ye. Eger bîmeya şexsî we liber bigire, divê liser qebûl kirina xercên xizmetên dermanî yê bi bandora jiberbirina zarrokî ser esasa zagona rabêjê gel bîme ya xwe rabêjê biken.

Eger qirarre hûn bixwe xercê jiberbirina zarrokî biden, baştire ku destpêkê liser xercê wê gel bijîşkê xwe biaxivin Li gor tecrûbeyan xercê xebata jiberbirina zarrokî pê dermanî dibe nêzî 250Euro, û bo jiberbirina zarrok pê nîştergerîyê 350 Euro ye.

Esasa hesab kirina xercê bijîşkî Zagonên Xercan bo Bijîşka (GOÄ) ne. Xizmetên hesab kirina xercên bijîşkî bo jiberbirina zarrokî tenê dikare heta 1.8 hemberî rêjeya dîyarkirî di qanûnê da bêne heasb kirin.

Eger jiberbirina zarrokî di nexweşxanê de pêwîst be, pêş emelê liser xercî gel nexweşxanê biaxivin, ji ber ku xercê xizmetan di nexweşxaneyên cûda da cûda ye û gelek zêdetire ji rewşa serpêyî.

Di rewşa jiberbirina zarrokî di nexweşxanê de dibe hûn hem xercê jiberbirina zarrokî û hem jî xercên dermanên duyemî yê bandorê wê biden. Agadar bin ku girêbesta xizmetên helbijartî yê bijîşkî îmza nekin daku xercên zêde ser we neyên sepandin.

Di çi rewşekê da xerc dikevine ser milê dewletê?

Herwisa liser qebûl kirina xercên Jiberbirina zarrokî bo jinên kêmderhat yan bêderhat ji alîyê eyaleta Niedersachsen agahîya pêşkêş dike

1. Cîyê jîyana serekî ya we Niedersachsen be.
2. Derhatîya we ya mehane bin 1.075 Eurobe. Ev sînorê derhatîya we pê her zarrokekê bin serpereştîya we bin 254 Euro zêde dibe, bi wî mercî ku zarrokê we bin temenê qanûnî be û endamê malbata we be yan bi pirranî bin serpereştîya we da be.
3. Xercê cihê rûniştinê (wekî kirrê) bo we yan zarrokên navbirî ku ji 315 Euro derbas nabe, ji sînorê derhatîya herîzêde heta 315 Euro zêde dike (roja: 01.07.2015, bo tevahîya rêjeyên dî pîvanek kêrhatî ye).
4. Sermayeya ku dem kurt hêjayî neqd kirinê be, tune ye.

Sînorên derhatîyê her salê di 1 juîye da serrast dibe.

Mercê qebûl kirina xercan, demekê ku hûn ji

- alîkarîyên civakî yê pirtûka dazde ya zagona civakî (SGB XII) behremend dibin,
- Ji xizmetên xercên jîyana dazde ya zagona civakî (SGB II) behremend dibin,
- alîkarîya xercê perwerdehîyê ser esasa bernameya rêveberîya kar bo piştîvanî ji rahênana pişeyî yan alîkarîya xercê şola kesê kêmendam yan alîkarîya xercî ser esasa zagona penaberîyê werdigirin
- Alîkarîya xercê perwerdehîyê ser esasa qanûna netewîya piştîvanî ji perwerdehîyê werdigirin yan
- dema xercên rûniştina we di bingehekê, rûniştgehekê yan binkeya wekhev ji alîyê rêveberîya xizmetên civakî yan ciwanan tê dayîn, pêşkêş kirî tê hesibandin.

Dibe dana xercan pêş jiberbirina zarrokî daxwaz biken. Derhatîya hevjîn yan dêbav nabe bê pirsîn û nabe bê hesibandin.

Liser jiberbirina zarrok pê dermana jî dibe daxwaz pêş destpê kirina dermanê bijîşkî ku pê wergirtina dermanê jiberbirina zarrok destpê dibe, pêşkêş bikin. Daxwaza qebûl kirina xercan ji alîyê eyaletê pêşkêşî bîme ya dewletî biken ku berpirsîya lêkolîna daxwazan di ev eyaletê ser milê wî ye. Jinên pêdivî ku bin sêbera bîmeya şexsî da ne jî dikarin daxwaza xwe ji bo qebûl kirina xercan pêşkêşî bîmeya dewletî biken . Pêvajoya daxwaza di rûpela 14 pêştir hatibû zelal kirin.

Qebûl kirina xercan paş pêkanîna emelê ne gengaze.

Liser jinên kêmderhat yan bêderhat ku jiberbirina zarrok pê rabêjê pêk dînin, tevahîya xercên têkildar yan bi rêya dewletê yan ji alîyê bîmeyê tên qebûl kirin. Bi giştî xercê xizmetên bijîşkî yê zêde li ber nagire. Lê eger di rewşên taybet da pêwîst be, girêbesta şexsî ya xizmeta li navbera we û bijîşê tedawîya we bê daxwaza kirin. Nabe xercê zêde bê daxwaza kirin. Xizmetên ku zêdetir ji dermanên pêdivî yê bijîşkî bin, wekî niştergerîyên xweşikkirinê ku hevdem gel jiberbirina zarrokî pêk tên, tenê demekê tên hesab kirin lu we daxwaz kiribe. Bi her rewşekê dibe liser ev xizmetane pêştir bi nivîskî rezamendî hatibe ragehandin.

Daxwaza qebûl kirina xerca dibe çawa û li ku bê pêşkêş kirin ?

Tevî ku xerc ji alîyê eyaleta Niedersachsen tên qebûl kirin, lê daxwaza dirav dana wan cem bîmeyên dewletî pêk tê.

Dema ku hûn

- bin sîbera bîmeya dewletî da ne, forma daxwazê cem bîmeya xwe werbigirin;
- bin sîbera bîmeya dewletî da nînin, forma daxwazê ji bîmeya dewletîya dilxwazî xwe di rûnîştgeha xwe da werbigirin;.

Mafê we heye ku pêvajoya daxwazê bi şêweya nivîskî pêk bînin, bi wî avayî ku ji (yek) bîmeyê bi telefonî forman daxwaz biken û paş tejî kirinê dişînin.

Ji ber ku nekevine ber fişara demî, baştire ku daxwaza xwe bi rewşa beşdarî di bîmeyê da pêşkêş biken û bixwazin ku bilez liser daxawza we biryarr bê girtin.

Eger we mercê qebûl kirina xercan ji alîyê eyaletê hebe (serdana rûpela 12 biken), belgeya qebûlkirina xercan hevdem tê ji were derkeve, û bi wî awaytî tê ji pêvajoyên demgirê postî rê bê girtin.

Hişyarî, ji bo jinên bin temenê zagonî:

Zagonên navbirî bo we jî rastin. Hûn dikarin dixwe daxwaza qebûl kirina xercan biken. Bîme ser esasa daxwaza we, dema hêjatîya we piştrast be, belgeya qebûl kirinaxercan ji were tomar dike. Bijîşkê tedawîker yan nexweşxane tenê pê pêşkêş kirina belgeya qebûl kirina xercan ku ji alîyê bîmê derdikeve, dikare xercên gel eyaleta Niedersachsen hesab bike. Divê hûn ji bîmeyê du belgeya qebûl kirina xercan werbigirin, kerema xwe her du guherto di roja jiberbirina zarrok pêşkêş bijîşk yan nexwşxanê biken. Êdî nepêwîste hûn bo fatûreya hesaban çi biken. Kerema xwe bîr nekin ku pêşkêş kirina daxwaza qebûl kirina xercan paş pêk anîna emelê mafê wergirtina xercan ji alîyê eyaleta Niedersachsen betal dike û dibe hûn bixwe xercê jiberbirina zarrokî biden.

Pêngava dawî: Jiberbirina zarrok

Eger we biryarra jiberbirina zarrok paş rabêjê heye, tê pêwîstîya we bi belgeyên jêr hebe

- Belgeya rabêjê, pê navê we, roj û îmzaya navenda rabêja pirsgirêkên ducanîya zagonî;
- di rewşa hebûna belgeya qebûl kirina xercan (yek) bîmeya dewletî;
- di rewşa ku bi sêbera bîmeya dewletî da bin, karta bîme ya we bo xercên ku rasterast têkildarî jiberbirina zarrokî nînin û ji alîyê bîmeyê tê dayîn;
- Di rewşa hebûna şiroveya zagonî (serdana rûpela 9 biken) di şona belgeya rabêjê tê pêwîstîya we bi belgeya şiroveya taybet û karta bîme ya we di rewşa ku bin sêbera bîmeya dewletî da ne, hebe.

liser şiroveya bijîşkî divê pêş dîyarkirina nivîskî ya şiroveyê, danenasîn ji navenda rabêjê û yan derbasbûn ji vê re rabigehînin. Ragehandina ev miajrê ber çavê ev bijîşkî be ku şiroveya pirsgirêkê li navbera sê rojan ji rabêjê pêk dîne. Ev mijare dema ku metirsîya cidî ser saxlemîya şexsî heye, neraste. Jiberbirina zarrok dikare serpê yan razanî pêk bê.

Bijîşk yan nexweşxaneya ku di nêzî cihê jîyana we da xebatê jiberbirina zarrok pêk dînin, dikarin di navendên rabêja pirsgirêkên ducanîyê izindar yan di bîmeyê da peyda biken:

Jiberbirina zarrokî pê dermanê Mifegyne® nabe di rewşên jêr da pêk be

- dema ducanî bi gştî piştrast nebe;
- dema gengazî ducanîya derweyê pizdanî (bo mînak liser ducanîya ne bi cî);
- dema destpêka bênimêja dawî zêdetir ji 63 rojên pêş be;
- Li dema hebûna bêntengîya giran yan dermannekirî;
- di rewşa hebûna nexweşîyên giran ya gorçikî û/yan cergê sipî;
- di rewşa hebûna alerjî ya Mifepriston;
- di rewşa hestyar bûna ji Prostaglandinen;
- di rerwşa tûşî bûn ji kêmasiya nanxwarinê.

Liser metirsîyên dî û bandorên kêlekî ji bijîşkê xwe bipirsin.

Di nîgarên jêr da cûdahîyên du şîweyên jiberbirina zarrokî hatine nîşan dan. Agahîyên bêtir dikarin di navendên rabêja pirsgirêkên ducanîyê yan bijîşkê tedawî kerê xwe peyda biken:

Rabêja paş jiberbirina zarrok

Eger paş pêkanîna jiberbirina zarrokî hêşta pêdivîya we bi rabêjê hebe yan pirsek we hebe dikarin serdana navendên rabêja pirsgirêkên ducanîyê di nêzî jingeha xwe da biken:

	Jiberbirina zarrokî pê dermanî û	jiberbirina zarrok pê nîştergerîyê
Ev mafe heta kengê berdewam dibe?	Heta 63 emin. ji destpêka bênimêjîya dawî	Heta hefteya 12 a ducanî bûnê, di rewşa hebûna pênaseya bijîşkî jî paş hefteya 12 a jî gengaz e. SSW
Jiberbirina zarrokî çawa pêk tê?	Bi rêya wergirtina dermanî bi rewşa serbixwe yan di avahîyê bijîşkî da	Pê nîştergerîya bijîşkî, bê his kirina endamî yan eger pêwîst be bêhiş kirina tam
Jiberbirina zarrokî çend dikşne?	çend rojan; bikaranîna du dermana pê navbera 36 û 48 demjimêran; tedwaîya kontrolê paş 2 – 3 hefteyan	Çen xûlek; tedawîya kontrolê 46 hefte paşê
Çi metirî û bandorên kêlekî gengazin?	Xwînrêjî, êşa binzik, mandîbûn, serêş, dilrabûn, werrêşan, hinavçûn, ta, gêjbûn, jiberbirina naqis di 1 – 4% babetan	Nîştergerîya devê pizdanê û cotê, birrînên ku dibine sedema nezanê, bûyerên bi sedema bêhiş kirinê

Mafê berdewam bûna wergirtina maf û mafê nexwşîyê

Li ser tevahîya jiberbirina zarrokên ku ji alîyê bijîşk pêk tê, mafê we heye ku heqê xwe werbigirin.

Liser jiberbirina zarrokî pê rabvêjê bê şiroveya bijîşkî, hûnê belgeya neşêyana wekî belgeya nexweşîyên asayî werbigirin, lê bo maweya ku bi sedemên jiberbirina zarrokî niakrin bişoxilion, hûn mafê nexwşîyê wernagirin.

Liser jiberbirina zarrokî pê şiroveya bijîşkî (serdana rûpela 9 biken), hûnê belgeya neşêyana wekî belgeya nexweşîyên asayî werbigirin. Mafê nexwşîyên ji alîyê bîmeya xizmetên dermanî tê dayin.